

# Qaideyêñ nav malê yên kempa penaberan

Wek rûniştvanê kempa penaberan, divê tu qaideyêñ nav malê bişopînî. Ew hatine nivîsandin da ku tu û rûniştvanêñ din jiyanekê ewledar û baş li kempê bijîn.

## 1 Bêdengî, nîzam û ewlehî

- Divê li kempê bêdengî hebe ji se'et 23.00 heta 06.00 an.
- Divê tu kesên din aciz nekî û bi awayekî ne baş li hember wan tevnegerî. Tundûtûjî ('inf), xirakirin an jî sûcêñ din dê ji UDI re werin ragihandin, û wê giliyê kesên sûcdar li cem polîs were kirin.
- Divê tu li cihêñ mişterek (hevpar) meşrûbê venexwî.
- Divê tu cixare, nergîlê û cixareyêñ elektronî li cihêñ mişterek an jî li odeya xwe nekêşî.
- Destûr tune ku tu heywanêñ kedî li kempa penaberan vehewînî.
- Divê tu xwe hîn bikî ka divê tu çi bikî eger krîzek çêbibe an jî agir bi kempê bikeve.

## 2 Bikaranîna ode û amûran

- Divê tu odayêñ mişterek û qada derve paqij bikî. Divê tu miqate bî ku bisiklet, erebokêñ zarokan û alav û hacetêñ din rîyêñ revê asteng nakin.
- Divê tu oda xwe paqij bikî û bidî hev.
- Divê tu gemara xwe ji çavkaniyê ji hev veqetînî û bavêjî sindoqêñ gemarê.
- Divê tu odayêñ mişterek ên hundir bi rêkûpêkî paqij bikî. Lîsteyek hatiye çêkirin ku dide xuyakirin kengî dora te ya paqijkirinê ye. Dema ku dora te were, divê tu paqijiya lazim bikî.
- Divê tu makîneyêñ şuştinê, alavêñ metbexê û alavêñ şuştinê wekî çawa di pirtûkêñ bikarhêneran de hatiye, bikar bînî.

## 3 Serdanêñ şevê

- Divê tu her gav ji kempê bipirsê gelo tu dikarî mîvanêñ şevê vehewînî yan na.
- Kemp dikare ji vehewandina mîvanêñ şevê re bêje na.
- Ew kesê ku dê li cem te raze, divê li Norwêcê bijî û nasnameya xwe an jî kerta penaberan şanî karmendêñ kempa penaberan bike.
- Dema ku mîvanêñ te yên şevê hebin, divê hun rihiya rûniştvanêñ din yên kempê li ber çavan bigirin.
- Tu bi xwe berpirsî ji dabînkirina xwarinê û nivînan ji mîvanêñ xwe re.
- Kesên mezin dikarin zarokêñ xwe, û heval û endamêñ malbatê yên ku li kempêñ penaberan yên din dijîn, bi şevê li cem xwe vehewînin.
- Zarokêñ di bin 18 salan de dikarin dêûbab, xwişk û birayêñ xwe û hevalêñ xwe yên hevtemen, bi şevê li cem xwe vehewînin.